

Peywendiya Mîr û Mela di Çarçoveya Patronaja Edebî de

Zülküf ERGÜN¹

Kurte: Di vê gotarê de peywendiya Melayê Cizîrî û Mîrê Cizîra Botan di çarçoveya patronaja edebî de tê vekolîn. Ji bo vê mebestê piştî ku taybetmendiyên patronaja edebî û nasnameya patronê Melayê Cizîrî tê ronkirin bi rêya helbestên wî peywendiya wî ya digel Mîrê Cizîra Botan tê berçavkirin. Di encamê de di vê gotarê de tê nîşandan ku Melayê Cizîrî bi çendîn helbestên xwe pesnê hêz, desthilat û comerdiya mîrên Cizîra Botan daye û wek helbestvanekî serayê hunera xwe xistiye bin xizmeta mîran û di beramber vê de jî ji aliyê wan ve hatiye padaştirin. Ji ber vê dema şanazî bi hunera helbesta xwe dike di heman demê de xurûra seraya patronê xwe jî temsîl dike û bi vî awayî yekem mînaka patronaja edebî pêşkêş dike di edebiyata kurdî de.

Bêjeyên Sereke: Patronaj, qesîde, Mîr, Mela.



Edebî Patronaj Çerçevesinde Mîr ve Mela İlişkisi

Öz: Bu makalede edebî patronaj çerçevesinde Melayê Cizîrî ve Cizîra Botan Emîrî ilişkisi ele alınmaktadır. Bu amaçla edebî patronajın özellikleri ve Melayê Cizîrî'nin patronunun kimliği konuları izah edildikten sonra seçilen şiirlerin içerik analizi yoluyla Melayê Cizîrî ile Cizîra Botan Emîrî ilişkisi ortaya konmaktadır. Sonuç olarak bu makalede Melayê Cizîrî'nin bazı şiirlerinde Cizîra Botan Emîrî'nin gücü, iktidarı ve cömertliğini övdüğü, bir saray şairi olarak sanatıyla emirlerin hizmetine girdiği ve bunun karşılığında da bu emirler tarafından ödüllendirildiği gösterilmektedir. Bundan dolayı kendi şiir sanatıyla övünürken aynı zamanda patronunun sarayının gururunu temsil ettiği ve Kürt edebiyatında ilk edebî patronaj örneğini sunduğu vurgulanmaktadır.

Anhtar Sözcükler: Patronaj, kasîde, Mîr, Mela.

¹ Öğr. Grv. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Makezanista Zîman û Çanda Kurdî, zwxweshewi@gmail.com

The Relation between Mîr (Head) and Mela on the Frame of Literary Patronage

Abstract: In this article, the relation between Melayê Cizîrî and head of Cizîra Botan are considered in the context of literary patronage. For this purpose, after the features of literary patronage and the identity of Melayê Cizîrî's boss were explained, the relation between Melayê Cizîrî and head of Cizîra Botan are revealed through content analysis of chosen poems. As a result, it is shown in this article that Melayê Cizîrî praised head of Cizîra Botan' power, generosity and his political power in his some poems. Additionally, Melayê Cizîrî as a palace poet entered into the heads of Cizîra Botan services with his art and he was rewarded by the Mîrs/heads. Therefore, it is emphasized that while the Mela was boasting his own poetry's art, at the same time he glorified the pride of the boss's palace and in this way, the first literary patronage example in Kurdish literary is offered.

Key Words: Patronage, eulogy, Mîr/head, Mela.

Destpêk

Erkên edebiyatê li gor serdem û rêbazên ciyawaz hertim di nav guherîna de bûye. Bêguman yek ji van erkan jî erka bangeşe (propaganda) û sûdparêziya (pragmatîzm) edebiyatê ye ku di çarçoveya sûda takekesî, civakî û siyasî de ji bo xizmetkirina armancên diyarkirî derdikeve holê. Bi taybetî di serdemên hikumraniya xanedanan de edebiyat bi vê erka xwe dikeve bin barê pesindana hikumdar û di beramber de jî derfetên bilindbûn û karîyerê ji bo edîb û helbestvanan dabîn dike. Ev têkiliya patrîmonyal dema ku ji bo helbestvanan deriyê îqbalê vedike ji bo hikumdar û zemîna bangeşe û reklamê saz dike û bi vî awayî sûdeke dualî encam dide. Digel vê yekê di navbera helbestvan û hikumdar de têkiliyê asîmetrîk heye ku hertim hikumdar wek çavkanî û navenda hêz û desthilatê, xwedî serwerî û otorîteyê reha ne û helbestvan jî peyk û perwaneya cazîbeya hikumdar in. Ji ber vê hejma hikumdar jî li hin welatên mîna Îngiltereyê qonaxên edebî jî bi navê şahbanûyên mîna Elizabeth û Victoriayê tên binavkirin (Wellek-Warren, 2013: 311) û sîstema patronaja edebî bi navê wan tê simbolîzekirin.

Li gor çavkaniyên berdest peywendiyên patronajê di edebiyata kurdî de cara pêşî di mînaka Melayê Cizîrî (1567-1640) û mîrên Cizîra Botan de tê dîtin. Mela bi du qesîde, danberhevek (muşar'ara) û çendîn xezelên xwe berê hunera xwe dide mîran û dibe danerê edebiyata pesindariyê di helbesta kurdî de. Bêguman ev diyarde di serdema Melayê Cizîrî de normeke cihanî bû û mirov dikare bibêje ku yek ji hokarên sereke yê berhemana edebî bû. Ji ber vê gelek helbestvan û edîbên wê serdemê bi mebesta gihîştina armancên xwe ji serayekê bo serayêke din diçûn û ji ku derê piştewaniyê bîhêz bidîta li wê derê cih digirt û hunera xwe ji bo pesindana wî hikumdarî bi kar dianî. Hikumdar jî bi mebesta têrkirina hesta xwe ya estetîkî, bîhêzkirina pêgeha xwe ya siyasî û belavkirina navdariya xwe xwedîti li helbestvanan dikir û ji hêza hunera wan sûd wêrdigirt.

Melayê Cizîrî wek helbestvanekî nivê duyem ê sedsala şanzdehan û nivê yekem ê sedsala huvdehan, di serdema hikumraniya mîrên Azîzan de li Cizîra Botan

dijî, di nav sîstemeke patrîmonyal de helbestên xwe berhem tîne û di dahênana wî ya edebî de roleke berbiçav a patronaja edebî çê dibe. Tevî vê yekê, ji ber nebûna agahiyên bibelge derbarê jiyana Melayê Cizîrî de û bidestneketina tomarên nivîskî yên mîrektiya Cizîra Botan em derbarê jiyana Mela de xwedî zanyariyên teqez nînin û em nizanin bê Melayê Cizîrî heta çi radeyê piştgirî ji dezgehên mîrektiye wergirtiye. Lê cihê gora wî ya ku di nav goristana taybet a malbata Mîr de ye (di Mizgefta Sor de), hin zanyariyên nav helbestên wî û ragihandinên nav gel derdixin ku peywendiyêke bihêz a Melayê Cizîrî bi seraya mîrên Cizîra Botan re hebûye (Ergün, 2014: 128-132) û di çarçoveya patronaja edebî de xwe spartiyê desthilata wan.

Di vê gotarê de em dê di pêngava pêşî de derbarê çavkaniya patronaja edebî û peywendiyên helbestvan û hikumdarên de agahî bidin, piştî vê jî ji ber ku derbarê muxatebê her du qesîdeyên pesinnameyî yên Mela de nêrînên ciyawaz hene em dê hewl bidin muxatebê rasteqîne yê van qesîdeyan destnîşan bikin. Li dû vê, em dê bi şîrovekirina naveroka her du qesîdeyên Mela peywendiya patronajî ya Mîr û Mela berçav bikin. Herweha li dor danberheva Mîr û Mela em dê behsa peywendiyên nêzik ên Mela û Mîr û hogiriya wan bikin. Herî dawî em dê şanaziya Mela ya helbestî di nav tora peywendiyên patrojana edebî de şîrove bikin.

1. Çavkaniya Patronaja Edebî

Ji destpêka avakirina rêvebiriyên monarşik heta jinavçûna vê sîstemê hikumdar ne tenê çavkanî û navenda desthilata siyasî û aborî ne, di heman demê de bi kesayeta xwe ya egosantrîk qîble û armanca sereke ya edebiyat û hunerê ne jî. Lewra di sîstema patrîmonyal de hikumdar di lutkeya pîramîda hiyerarşîya desthilatdariyê de cih digirin û bi hêzeke reha weku rojê li ser her tişt û her kesî hikum dikin. Çawa ku di mînaka Destana Gilgamêşê û bajarên Sumerê de jî tê dîtin dema hikumdar li hember xwedawendên perestgehê û zilamên dîni têdikoşin û hêza wan lawaz dikin di hemû warên jiyane de dibin tekane hêz û otorîteya rêvebiriyê û her tiştî dikin bin kontrola xwe. Piştî vê serkeftinê hemû pîrozîyên xwedawendan derbasî hikumdarên dibin û her hikumdarek mîna xwedawendekî xwe bihêz û xwedî keramet dizane. Ji ber vê çendê, hikumdarên pêşî weku tekane çavkaniya rewatiya rêvebiriyê, di kesayetîya xwe de hemû beşên jiyane, welat û hemwelatîyan temsîl dikin (Mumford, 2007: 54) û bi vî awayî li ser mirovan otorîteya xwe ya reha disepînin.

Ji ber van hokaran û piştî damûdezgehkirina sîstema dewletdariyê hikumdar wek navendeke cazîbeyê her tiştî û hemû hêzên şaristaniyê li dora seraya xwe dicivînin (Mumford, 2007: 51-52) û li dor vê sîstemê xwe dikin çavkaniya hemû hêz, îhsan û hunerê û herkesî mîna peykan li dora roja hikumdariya xwe digerin. Ji ber vê jî Lapidus peydabûna patronaja edebî bi kesayeta hikumdarên ve girê dide û diyar dike ku “bi rêya vê parastinê hikumdarên huner û edebiyat weku neynika erêkirina xanedaniya xwe ya narsîstî bi kar dianî û bi rêya helbestvanan, seraya xwe weku bihişt, hukmê xwe cîhanî û kesayetîya xwe weku sîbera Xwedayî nîşan didan” (Lapidus, 2005: 136). Her di vê çarçoveyê de mîna ku Ahmet Yaşar Ocak

ji Cahen radigihîne Fexreddîn Behramşah ji aliyê sultanen ve sedema xelatkirina helbestvanan weha derdibirîne: “Eger helbest serkeftî be ez dê xezîne û defîneyan bibexşînim. Lewra bi vê pirtûka menzûm dê navê min di vê cîhana fanî de hertim bimîne. Di vê cîhana fanî û demkî de jibîrnebûn û mayîna navê mirov îtibareke mezin û serkevîneke hêja ye” (Ocak, 2011: 306). Ji ber vê çendê jî, hîn di bajarên pêşî yên Mezopotamya û Misirê de li serayên hikumdarên helbestvan û edîbên serayan peyda dibin û bi vî awayî demeke dirêj edebiyat û bi taybetî helbesta serayê li dor pesindana kesayetîya hikumdarên û hêvî û daxwazên jiyana wan tê hûnandin.

Di cîhana îslamê de jî piştî damezirandina dewletên Emewî û Ebbasî edebiyateke xurt a serayê derdikeve holê û gelek helbestvan û edîb li dora serayê dicivin. Di vê serdemê de edebiyat heta radeyeke baş karê çîneke diyarkirî ya mîna rêvebir û karmendên resmî ye ku ev kesayet xwe dispêrin otorîteya xelîffe. Lê di nav demê de ji bilî van kesayetên hinek zanyarên medreseyan jî bi mebesta teltîf û tewecuha hikumdarên û civakê di nav van edîbên serayê de cihên xwe digirin (Hodgson, 1993: 426). Lewra di nav sîstema monarşîk a dewletên berê de tekane rêya xwe gîhandina pile û payeyên bilind ên civakî û dabînkirina jiyaneke baş bidestxistina îltîfat û îhsana hikumdarên û çîna serdest bû. Ji ber vê çendê, helbestvan û edîb bi armanca gihîştina parastina hikumdarên xwedî mulk û bidestveanîna rizamendiya rêvebirên bihêz, berê xwe didin serayê. Lê divê mirov vê jî bizane ku di peywendîya edîb û serayê de patronaj û parastin ji hewcedariyê du-alî pêk dihat. Lewra çawa ku helbestvan û edîb bi saya parastina hikumdar û serayê dibûn xwedî şan, şeref û pere; her weha hikumdar jî bi rêya van edîb û zanyaran nav û nîşanên xwe mezin dikirin (İnalçık, 2010: 13). Ji ber vê çendê jî piraniya helbestvan û edîbên baş xwe dispêrin hîmayeya hikumdarê û bi saya vê berjewendîya du-alî berhemên hêja li dû xwe dihêlin. Ji ber vê jî bi gotina George Makdîsî bextê edebiyatê rasterast bi bextê hikumdarên ve tê girêdan û bi bilindbûn û daketina xanedanan edebiyat jî bilind dibe û dadikeve (Makdisi, 2009: 284).

Di nav vê norma cîhanî de piştî derketina mîrekiyên kurdî di dawiya serdema Ebasîyan de di nav kurdan de jî dîwan û navendên rêvebiriyê peyda dibin û ev dîwan jî wek nimûneyên biçûk ên dîwanên paytexta xelîfetiye tîrên rêxistin. Di van dîwanan de jî kesên zana, edîb û rayedar kom dibin û di birêvebirina karûbarê mîrekiyê de rol dibînin (Ebûş, 2004: 89). Ji ber vê rola wan a girîng jî ev kesayet weku unsûrên jêneger ên rêvebiriyê tîrên qebûlîkirin û ji ber pêdiviyên burokratik ji aliyê mîrekan ve tîrên parastin. Di encama vê parastinê de jî li ser destê van kesan berhemên îlmî û edebî derdikevin holê û serayên wan dibin navendên peydabûna berhemên edebî ku Cizîra Botan yek ji van navendan e.

2. Melayê Cizîrî Wek Helbestvanekî Mîrekiya Cizîra Botan

Ji destpêka bajar-dewletan heta bicîhbûna damûdezgehên modernîteyê hem li rojhilat hem jî li rojavayê navendên herî bihêz ên huner û edebiyatê serayên hikumdarên bûne û her seray li gor hêza hikumdarê xwe bûye navenda dahênana edebî û hunerî. Di vê çarçoveyê de seraya Mîrekiya Cizîra Botan yek ji serayên herî

bihêz ên mîrên Kurdistanê bûye û di derketina helbestvanekî mîna Melayê Cizîrê de kartêkeriyeke berçav a vê serayê hebûye. Di dîwana Melayê Cizîrî de çendîn helbest hene ku peywendiya Melayê Cizîrî digel seraya Cizîra Botan berçav dikin. Bi taybetî her du qesîdeyên wî yên ku ji bo pesindana Mîrê Cizîra Botan hatine nivîsîn, nîşaneyên bihêz ên vê peywendiyê ne. Lewra qesîdeyên pesindanê di eslê xwe de cure helbestên serayê ne û ji bo bidestxistina îltîfata hikumdarên tînan nivîsîn. Weku Halil Înalcık jî dibêje di edebiyata rojhilatê de lêgerîna hîmaye û arîkariyê bi rêya pêşkêşkirina qesîdeyan xwe nîşan dide (Înalcık, 2010: 23) û nivîsîna qesîdeyan jî zêdetir karê helbestvanên serayê ye. Loma jî ev her du qesîdeyên Melayê Cizîrî nîşan didin ku Mela helbestvanekî serayê bûye û xwe sipartiyê hîmayeya Mîrê Cizîra Botan.

Ji van her du qesîdeyên Melayê Cizîrê yek jê bi malika “Xanê xanan lami’ê necma te her purnûrî bî/ Keştiya bextê te ez bayê muxalîf dûrî bî” dest pê dike. Herçend Melayê Cizîrî di qesîdeya xwe de navê Mîrê Cizîra Botan aşkera nekiribe jî cih dide navê paytexta Mîr û Cizîrê weku “paytexta heft îqlîman” raber dike. Ji ber vê çendê tu guman tê de namîne ku ev qesîde ji bo pesindana Mîrê Cizîra Botan hatiye gotin. Mela bi vê malikê seraya Mîrê Cizîra Botan wek navenda hemû cîhanê dide zanîn û patronê xwe mezin dike.

Ma Cizîrê şubhê darê textê heft iqlîmi bit

Hem bi hukm û seltene Eskender û Fexfûrî bî (Cizîrî, 2010: 224)

Qesîdeya duyem a Melayê Cizîrî bi malika “Ey şehinşahê mu’ezzem Heq nîgehdarê te bî/ Sûreê “Înna Fetehna” dor û madarê te bî” dest pê dike. Li ser muxatebê vê qesîdeya Mela di nav lêkolerên edebiyata kurdî de fikrên ciyawaz peyda bûne. Lewra ev kes, bê ku tevahiya qesîdeyê û rastiyên dîrokî li ber çav bigirin, ji hin malikên ku ji bo pesindanê hatine gotin, encamên nerast derxistinine. Bo nimûne:

Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin

Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî (r. 222)

Eladîn Secadî jî di *Mêjûy Edîbî Kurdîya* xwe de muxatebên van her du qesîdeyên Melayê Cizîrî ji Sultan Huseyn Baykarayê Teymûrî yê hikumdarê Îranê û Sultan Fatîh û Bayezîdê Duyemê Osmanî yekî dizane (Secadî, 1952: 159-160). Herweha ji ber ku di serdema Sultan Selîm de di şerê Çaldîranê de Sefewî tînan şikandin û Tebrîz ji aliyê hêzên Osmanî ve tê dagîrkirin ev malik Sultan Selîmê Osmanî û ji ber kudi serdema Sultan Suleyman û Sultan Muradê Çarem de li dijî Eceman sefer tînan lidarxistin û dewleta Sefewî bi destê van sultanên tînan şikandin heman malik Sultan Suleyman û Sultan Murad bi bîr bîne jî (Doru, 2016: 21), bi raya me ev boçûn û îhtîmal ji rastiyê dûr in. Lewra Fatîh Sultan Mehemed di 1512an de, Sultan Selîm di 1520î de Sultan Suleyman jî di 1566an de dimirin. Ji ber vê çendê

di serdema Fatîh Sultan Mehemed û Sultan Selîm de hêja Melayê Cizîrî nehatiye dunyayê û di sala mirina Sultan Suleyman de jî Melayê Cizîrî ji dayîk bûye. Ji ber vê jî dîroka hikumraniya van sultanen û jiyana Melayê Cizîrî hev nagirin. Li aliyê din eger Melayê Cizîrî helbesta xwe ji bo Sultanê Osmanî binivîsanda divê yan bi osmanî yan bi farisî yan jî bi erebî binivîsanda, lewra zimanên carî yên wê serdemê ev ziman bûn û bi kurdî heta wê demê ew çend berhemên edebî nehatibû nivîsîn. Ji ber vê çendê, herçend serdema jiyana Mela û Sultan Muradê Çarem hev bigirin jî em bi rehetî dikarin bibêjin ku ev qesîde jî mîna qesîdeya pêşî ji bo Mîrê Cizîra Botan hatiye nivîsîn. Lewra ev malika jêrîn cihê hukmê kesê ku tê pesinandin bi aşkerayî nîşan dide.

Ger çî der îqlîmê rabi' hate textê seltenet
Padişahê hefti îqlîman selamkarê te bî (r. 222)

Ji vê malikê derdikeve ku kesê tê pesinandin paytexta wî di îqlîma (herêm) çarem de ye. Li gor zanista coğrafyaya berê mîna ku İbn Haldun jî dibêje Cizîr dikeve îqlîma çaran û beşa şeşan, lê Stenbola ku paytexta dewleta Osmanî bû di îqlîma pêncan û beşa çaran de bû (İbn Haldun, 1991, 313, 319). Ev agahî jî piştrast dike ku muxatebê vê qesîdeyê ne Sultanê Osmanî ye, Mîrê Cizîra Botan e. Dîsa her ji ber vê peyva “Tebrîz”ê ya ku di malika navborî de derbas dibe, li gor veguhestina Hejar, Mehemed Emîn Zekî Beg muxatebê vê qesîdeyê Îmaduddîn Zengî zaniye ku di wê serdemê de Tebrîz di bin hukmê wî de bûye. Lê bi boçûna Hejarê şîrovekarê dîwana Melayê Cizîrî, navê Tebrîzê tu carî nabe delîl ku muxatebê vê qesîdeyê fermanrewayê Tebrîzê be. Lewra Mela ji Xweda xwestiye ku ew mîrê kurd ê Cizîrê ku rewac daye îslamê û feqî û melayên wî gelek hene û dersên Quran û hedîsan dibêjin, Xweda wî baladesttir bike û wî bike xwediyê heft îqlîman. Ji ber vê jî ji Xwedê hêvî kiriye ku ne tenê mulkê Kurdistanê, Tebrîz jî bê ser hikumeta wî û xwediyê mulkê Xorasanê xwe bide ber daldeya wî (Hejar, 1361: 16-21). Mela Ehmedê Zivingî jî bikaranîna peyva “Tebrîz”ê bi mubalexeya helbestê ve girê dide û muxatebê qesîdeyê Mîrê Cizîra Botan dizane (Zivingî, tîpa yê). Jixwe qafiyeya vê qesîdeyê ku bi peyva “bî”yê hatiye çêkirin di seranserê qesîdeyê de bi wateya hêvî û niyazê tê bikaranîn û ji halê mewcud zêdetir daxwaza Mela nîşan dide.

Mela Ehmedê Zivingî (?), Sadiq Behaedîn Amêdî (1998) û Abdullah Yaşın (2007) radigihînin ku ev qesîde ji bo Xan Şerefê Mîrê Cizîra Botan hatiye nivîsîn. Lewra Xan Şeref, di nav mîrên Cizîra Botan de navdartirîn mîr e û di dîroka vê mîrekiyê de xwedî cihekî taybet e. Ji ber rizgarkirina Cizîrê ji bin dagîrkariya Aqqoyîniyan û berxwedana li hember Sefewiyan li gor jêderên dîrokî menqîbeyên rêvebirîya dadperwer a Mîr Şeref di nav xelkê de dibe çavkaniya gelek çîrok û serpêhatiyên qehremaniye (Sevgen, 1982: 54). Lê çavkaniyên dîrokî aşkera dikin ku Mîr Şerefê Duyem ku bi nasnavê Xan Şeref tê nasîn berî şerê Çaldiranê, di sala 1509an de miriye (Varlî, 1997: 345) û 57 sal berî jidayîkbûna Mela çûye ser heqiya xwe. Jixwe li gor Şerefhan Bedlîsî (2007) di 1597an de li ser textê Mîrekiya Cizîra Botan Mîr Şerefê Sêyem rûniştiye. Ji ber vê çendê jî, ew delîlên ku kesayetên

navborî ji bo Xan Şeref tînin di heman demê de ji bo Mîr Şerefê Sêyem jî derbas dibin û rasterast ji Xan Şeref re nabin delîl.

Bi dîtina me ji bo diyarkirina muxatebên qesîdeyên Melayê Cizîrî du tişt girîng in, ew jî serdema jiyana Mela û diyarkirina mîrên wê serdemê ne. Herçend derbarê serdema jiyana Mela de fikrên ciyawaz hebin jî fikra herî maqûl û rast ew e ku Melayê Cizîrî di navbera salên 1566/1567 û 1640î de jiyaye. Li aliyê din li gor ragihandina Şerefexan ku berhema xwe di 1597an de tamam kiriye mîrê Cizîra Botan ê wê demê Mîr Şerefê Sêyem e. Loma jî bi dîtina me yek ji muxatebên muhtemel ên van her du qesîdeyên Mela, ev mîr e. Lewra dema mirov li salixdanên Şerefexan ên derbarê Mîr Şerefê Sêyem dinêre ev qenaet li cem mirov bihêztir dibe.

Emîr Şeref, ji mîrên hilbijartî û tekmêr ên xanedana mezin a Fermanrewayê Cezîrê yê herî mezin e. Çunkî di meydana merdî, mêrxasî û alkariyê de ji emsal û dijminên xwe yên di vî warî de serdesttir e. Di meydana merdan de bi kaşoyê mêraniyê gog ajotiye û sebebên rêz û payeyiyê hemî ji xwe re girtiye. Qehra zendên wî yên bivirî û şûrê wî yê tûj û birekî, tev delîl û îsbatên hêjayetî û serdestiyên mîr û mêrxasiyên wî yên ketina ceng û şeran in. Wekî şair gotiye:

Di dema merdîtî, Xatem tama ye, çiloz e, bê mecal
Di ceng û şer de, henekan dike bi Rustemê Zal

A herî rast ew e ku, re'aya û esker ji dadwerî û qencyên wî razî ne û ji fikir û xebatên wî spasdar û minnetdar in ji kirinên wî yên mirovane dilxweş û şad in. Ji ber vê jî ji aliyê giregir û mezinan, kesên di rêzê de, kesên nêzîk û dûr her kesî ve tê hezkirin. Hemî ev kesên han her wext ji Xwedê hêvî û lava dikin ku vî mîrê jîr û jêhatî ji wan re biparêze (Bedlîsî, 2007: 239).

Ji van salixdanên Şerefexan mirov têdigihîje ku Mîr Şerefê Sêyem ji aliyê Cizîriyan ve gelek hatiye hezkirin û ji ber ku serdema hikumraniya wî rastî salên kemalê yê Melayê Cizîrî tê, maqûltir e ku mirov bibêje Mela qesîdeyên xwe pêşkêşî vî mîrî kirine. Lewra malika dawî ya vê qesîdeyê jî nîşan dide ku ew Mîrê ku qesîde ji bo wî hatine pêşkêşkirin sax e û Mela hêvî dike hertim di xizmeta wî de be.

Qest û daxwaza Melê daîm ji can û dil ev e
Her di benda xizmetê pêşdestê dîdarê te bî (r. 223)

Diyar e, bi pêşkêşkirina van qesîdeyan, Melayê Cizîrî dikeve bin parastina Mîrê Cizîra Botan û bi ihtîmaleke mezin piştî vê yekê, Mela weku muderisê Medresaya Sor tê destnîşankirin. Lewra bi gotina İnalçık dema helbestvanekî qesîdeyek pêşkêşî hikumdarekî bikira, arîkariya hikumdar xwe bi awayên ciya ciya nîşan dida. Hikumdar li gor pîşeyê wî helbestvanî eger munşî bûya ew dikir

katib, eger ji çîna ulemayan bûya yan ew weku muderis yan jî weku qazî tayîn dikir (Înalcık, 2010: 28). Xuya ye ku Mîrê Cizîra Botan jî li hember van qesîdeyên wî, Mela bi muderisiya medreseya herî mezin a Cizîrê ku Medreseya Sor bûye padaşt kiriye ew xistiye bin parastina xwe. Ji xwe sîstema parastinê ne tenê li serayên padîşahên mezin di koşkên paşa û mîran de jî dihat dîtin. Hêjayê gotinê ye ku her du helbestvanên mezin ên îranî Se'dîyê Şîrazî (1213-1292) û Hafîzê Şîrazî (1315-1390) jî xwedî patronên weha bûn û Ebu Bekîrê Salguriyê patronê Se'dî û Ebû Îshaqê Încû û Şah Şuca'yê Muzaferiyê patronên Hafîz jî ew çend navdar û xwedî desthilateke berfireh nebûn (Înalcık, 2017: 25,28).

3. Mîrê Bihêz û Melayê Lawaz

Cewher û binyada helbestên pesindariyê li ser mezinkirin û bilindkirina kesayeta hikumdar, berçavkirina hêz û şiyana wan û nîşandana lawazî û hewcedariya helbestvanan tê avakirin. Helbestvan bi armanca bîdestxistina parastin û arîkariya hikumdar bi teşbîhên curbicur berziya hikumdar û nizmiya xwe berçav dike da ku bigihîje armanca xwe. Melayê Cizîrê jî bi her du qesîdeyên xwe doza hîmayekirinê li Mîrê Cizîra Botan dike û hewl dide bikeve bin xizmet û parastina wî. Ji ber vê jî Mîr dişibîne rojê, asîтана dergehê wî weku cihê bîdestxistina dewletê destnîşan dike û bi vî awayî hikumdar weku çavkaniya hêz û îhsanê û xwe jî bende û muhtacê wê hêz û îhsanê raber dike.

Lew ziyaret asîtanê tete şemsa dewletê

Da sehergahan ji dîdarê şerîf purnûri bî (r. 224)

Di vê malikê de xuya dibe ku seray; navend û çavkaniya ronahî, feyz û îhsanê ye û bi îradeya hikumdar ve girêdayî ye, helbestvan jî perestîşkar û daxwazkarê vê feyz û ronahiyê ye. Eger helbestvan bi dîdara Mîr şad û şerîf bibe wê demê ne tenê seher, dê helbestvan jî “purnûr” bibe. Bi vî awayî Mela, weku çavênê û hewcedarê lutfa Mîr, bi vê malikê rasterast daxwaza parastinê lê dike. Li aliyê din bi hêmayeke hevbeş a helbesta klasîk Mîr dişibîne rojê û mezinahiya wî berçav dike. Lewra mîna ku Ahmet Hamdi Tanpınar jî dibêje di nav xeyalên helbestî yên Serdema Navîn de hikumdar hertim bi rojê hatiye şibandin û mîna rojê ronahî li derûdora xwe belav kiriye (Tanpınar, 2010: 23). Ev jî nîşan dide ku Mela jî mîna helbestvanên din ên rojhilatî ji ber ku Mîr weku şah û padîşahên din, navenda hêz û îhsanê zaniye bi heman awa û edayî doza parastinê lê kiriye.

Melayê Cizîrî jî bo dabînkirina parastina Mîr, di dirêjahiya qesîdeya xwe de bi sîtayîş wesfên Mîr dide û ji bo pesnên xwe bihêz bike Mîr dişibîne hin hikumdarên mezin û efsanewî. Di qesîdeyê de hatiye ku Mîr bi dadperweriya xwe mîna Nûşîrewan, bi comerdiya xwe mîna Hatem, bi hukm û desthilata xwe mîna Eskender û Fexfûr, bi bezm û kamiraniya xwe mîna Cem, bi bereketa xwe ya manewî mîna Rûhilqudus, bi temendirêjîya xwe mîna Xizir û Nûh, bi zêdebûn û firehiya mulkê xwe mîna Zulqerneyn û bi karîgeriya desthilata xwe ya efsanewî mîna Suleyman pêxember e. Herweha Mîr wusa bihêz û dilêr e ku Xusro û Şapûr ne bendê wî

ne, belku bendê kurê wî ne. Bêguman mezinkirina hikumdarên armanca sereke ya qesîdeyan e û şibandina wan bi şah û padîşahên berê yek ji taybetmendiyên gîştî yên edebiyata klasîk a îslamî ye. Lewra şibandina hikumdarekî bi hikumdarên berê vedigere serdema Emewîyan û li gor ku Tanpînar ji Teberî radigihîne cara pêşî xelîfeyê Emewî Yezîd xwe bi padîşahên berê şibandiye û gotiye: “Ez kurê Merwan û Xusrev im. Kalê min Qeyserê Bîzansê ye û Xaqanê tirk bapîrê min e” (Tanpînar, 2010: 25). Mela jî li ser vê rêbazê weha salixê Mîrê xwe dide:

Paşê Newşîrwan dibêm dê hakimê ‘adil tu yî
Mislê Hatim dê bi danê der cîhan meşhûrî bî

Ma Cizîrê şubhê darê textê heft iqlîmî bit
Hem bi hukm û seltenet Eskender û Fexfûrî bî

Mislê Cem cama zerîn xalî nebî te j’badeyê
Da ji xemra şadimanî daîma mexmûrî bî

...

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê şapûrê te bin ta Xusro û Şapûrî bî

...

Şubhetê Rûhilqudus ‘erdê tu pê lê dayinî
Sebze û reyhan û nesrîn û gulê menqûrî bî

...

Ma te ‘umrê Xedr û Nûh û mulkê Zulqerneyn bitin
Gunbeda çerxê melemme’ her bi te me’mûrî bî (r. 225-226)

Ji bilî şibandina şah û padîşahên berê, Mela ji bo berçavkirina hêz û desthilata Mîr û hêza wî ya cengê gelek caran ji objeyên asîmanî jî sûd werdigire û bilîndiya Mîr bi alegoriya unsurên asîmanî berçav dike. Ji ber vê jî Mela dema behsa patronê xwe dike weha nîşan dide ku di serdema cengê de stêrkên Zuhre û Kêwanê dikevin bin rikêba wî, heft stêrk û neh gêrestêrk ji bo kar û xizmetê li dora wî digerin û dema dest bi fetha ezel jî dike taca serê wî wek rojê birûsk vedide û stêrk li dora vê tacê çerx didin.

Her kinarê pê ve wergêrî ‘inanê himmetê
Zuhre bî peykê te û Kêwan rikêbdarê te bî

...

Seb‘eyê seyyare û neh çerxê sergerdan bi vê
Girdîş û dewrê ‘eceb der xizmet û karê te bî

...

Lami‘ê fetha ezel berqê ji ber tacê te dit
Kewkeba Se‘da ebed necmek ji seyyarê te bî (r. 221)

Li gor Mela ji ber vê hêza asîmanî û bêwêne kî li dijî fermanên Mîr derkeve weku findekê mehkûmê helandinê ye û nikare xwe ji ber derbên şûrên wî rizgar bike. Eger ew kes şahbaz be jî nikare xwe ji tora desthilata Mîr rizgar bike û dê bibe nêçîra wî. Ji ber vê jî li gor Mela her kesê ku xwedî aqil be divê bikeve bin xizmeta Mîr û dewlet û xweşbextiyê li ber dergehê wî bigere ku çavkaniya lutf û îstîxnayê ye.

ö 162

Melayê Cizîrî

Ê ji emrê te‘y mukerrem serkeşî kit şubhê şem‘
Ber serê tîxê te û meqtûlê mûkarê te bî

Şahibaz er çendî perwazê bi bala bêt û ret
Dê di nêv tora te bêt û seydê şunqarê te bî

...

Her serê dewlet hebit dê her di nêv benda te bit
Her kesê ‘aqil bitin dê her di çokarê te bî

Ê divêt azade bit dê çehvinêr lutfa te bit
Her çî istixna di dil ber minnet û parê te bî

Her kesê qestek di dil dê qestê dergahê te kit
Ê di xatir ercû kit dê her ricakarê te bî (r. 222-223)

Li hember vê hêza Mîr, Mela jî mîna herkesî dixwaze bikeve bin hîmayeya wî û ji aliyê Mîr ve bê qebûlkirin. Lewra Mela li hember vê hêz û comerdiya nedîtî Mîr weku Suleyman pêxember û xwe jî di hafa wî de weku mûrekî dibîne. Piştî ku Mela

bi xizmeta Mîr şa dibe, dibêje ew kesê mîna teyrê goyîn nekeve bin xizmeta Mîr dê şerpeze bibe û têk biçê. Aşkera ye ku Mela helbestvanan dişibîne teyrê goyîn, lewra helbestvan jî mîna teyrê goyîn bi helbestên xwe di hizura Mîr de dinalin û dermanê nalîna wan jî tenê parastin û tewecuha Mîr e.

Ger çî der dîwanê hedret pur heqîr in şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleymanî bi halê mûri bî (r. 226)

Ê ne wek goy bê ser û pa bêt di benda xizmetê
Ma di çewgana te her perkende û meqhûrî bî (r. 226)

Ji ber vê, Mela hêvî dike ku her di xizmeta Mîr de be, sînga xwe jê re bike deryaya gotinên mirarî û pê pesnê wî bide. Loma jî amadehiya xwe nîşan dide ku tu caran li ber dergehê dewleta Mîr winda nebe û her di bin fermana wî de bi “me’ mûrî” bimîne.

Her di medhê te’w senayê sîne û qelbê Melê
Bê tafawut qulzema purlu’luwê mensûrî bî

J’asitanê dewletê xaib nebî carek Mela
Da ji fermanê mukerrem dem bi dem me’ mûrî bî (r. 226)

Qest û daxwaza Melê daîm ji can û dil ev e
Her di benda xizmetê pêşdestê dîdarê te bî (r. 223)

Diyar e, Melayê Cizîrî bi van her du qesîdeyên xwe di çarçoveya mezmûnên hevbeş ên şaristaniya îslamê de pesnê lehengî, hêzdarî, dadperwerî û ciwamêriya patronê xwe dide û doza parastinê lê dike. Lê dema vê dike di her du qesîdeyên xwe de jî tenê cih dide beşa medhiyeyê û beşên din ên mîna nesîb, texezzul, girîzga û fexriyeyê la dide. Ev jî ji ber vê çendê ye ku beşa medhiyeyê ji beşên din cudatir rasterast berê xwe dide patron û pesnê wî dide. Lewra bi gotina Banarlı bi derbasbûna demê re ev beş dibe armanca sereke ya qesîdeyan (Banarlı, 1997: 188) û hin helbestvanên mîna Melayê Cizîrî pêwîstî bi beşên lawekî yên din ên qesîdeyê nabînin û qesîdeyên xwe bi vê beşê sînordar dikin.

Hogîriya Mîr û Mela

Helbesta sêyem a ku peywendiya Melayê Cizîrî û mîran nîşan dide danberheva Mîr û Mela ye. Ev helbesta gotûbêjî ji aliyê Mîr Umadeddîn' û Melayê Cizîrî ve hatiye danîn û asta nêzîkbûna Mela nîşan dide digel desthilatdaran. Bêguman di nav sîstema patronajê de ji bo helbestvanekî îltîfata herfî mezin hogîriya (musahibî) hikumdarên û rêvebiran e. Musahibî tê wateya şêwirmendiya hikumdar û hevaltîya razên wî yê şexsî û hevrêtiya wî ya jiyane (Înalçık, 2010: 24). Di vê wateyê de danberheva Mîr û Mela vê nîşan dide ku Mela di kariyera xwe ya edebî de gihîştîye pileyeke bilind ku ew jî hevaltîya digel mîran e. Li aliyê din danberheva Mîr û Mela nîşaneya herfî bihêz a peywendiya Melayê Cizîrî ye digel serayê. Ev peywendî ew çend bihêz û xurt e ku dema Mela wefat jî dike ev peywendiya xurt xwe nîşan dide û Mela di nav goristana taybet a malbata Mîr de tê veşartin û wek endamekî malbata Mîr dibe mezherê îltîfateke taybet.

Danberheva Mîr û Mela bi gotin û silava Mela dest pê dike. Lewra Mîr ji ber hêz û otorîteya xwe muqîm e û her kes û her tişt li dora wî digerin. Mela jî weku piraniya helbestvanên serdema xwe hewcedar û daxwazkarê îhsana Mîr e û ji bo xwe bigihîne xizmeta Mîr û ji aliyê wî ve bê qebûlkirinê divê cara pêşî ew li Mîr silav bike.

Mela:

Selama min senaxwanî sehergeh gewher'efşan bit

Bi sûret emrê Subhanî ser elqabê zer'efşan bit

Bi xizmet 'erdê sultanî 'ebîr û 'enber'efşanî

Mîr:

Selama sanî'ê Qadir Mela da pê mu'etter bî

Muferreh bit me lê xatir peyapey lê mukerrer bî

Ji cama xatirê 'atir me jê ayîne enwer bî (r. 302)

¹ Mîna muxatebên qesîdeyên Mela li ser Mîr Umadeddîn jî di çavkaniyan de îddîayên ciyawaz hene. Merûf Xeznedar ji ber ku derbarê Mîr Umadeddîn de agahiyên dîrokî bi dest naxe her du beşên vê helbestê jî aîdê Mela dizane û Mîr Umadeddîn kesekî xiyalî dihesibîne (Xeznedar, 2010: 346-347). Abdullah Yaşın diyar dike ku Mîr Umadeddîn kurê Mîr Şerefê Duyem e û heval û şagirdê Melayê Cizîrî ye (Yaşın, 2007: 53-54). Lê li ser kêla Mîr Umadeddînê kurê Şerefê Botî dîroka 914ê koçî hatiye nivîsîn û ev jî nîşan dide ku Mîr Umadeddîn di 1508/1509ê zayînî de miriye û ev jî beriya jîdayîkbûna Melayê Cizîrî ye. Li gor Selefî û Doskî jî Mîr Umadeddîn mîrekî ji mîrên Hekariyê ye û xwendekarê Melayê Cizîrî bûye (Selefî-Doskî, 2008: 76). Li ser destnivîsa Taha Ebabekir a dîwana Melayê Cizîrî jî navê mîrê ku bi digel Mela helbest gotiye "Emîr Emadeddîn el 'Ebbasî-yî'l Hekkarî quddîse sirruhuma" hatiye nivîsîn (Amêdî, 1998: 53). Doskî di xebateke xwe ya çapnebûyî de li ser Mîr Umadeddîn bêtir agahî dide û bi palpiştîya du destnivîsên dîwana Mela (Destnivîsa Mihemed Esmereş Xoşabî -1872- û destnivîsa Mihemed Sebrîyê kurê Mela Ebdulfettahê Herşînî -1923-) diyar dike ku Mîr Umadeddîn yek ji mîrên Hekariyê bûye, hevaltîya Melayê Cizîrî kiriye, bi nasnavê Sebûrî helbest nivîsîne û heta niha heft helbestên wî bi dest ketine (Doskî, 24-25). Bi vî awayî diyar dibe ku ev mîr ji mîrên Hekariyê ye û bi gotina Bruinessen (Bruinessen, 2033: 251) dibe ku li gor taybetmendiyên wê serdemê weku mêvan yan jî şêwirmend di seraya Cizîra Botan de mabe û peywendiya wî bi Melayê Cizîrî re çê bûbe.

Herçend Mîr bi vê danberhevê Mela muxateb qebûl kiriye û qedrê wî girtiye jî, hiyerarşiya navbera Mîr û Mela di seranserî danberhevê de bi awayekî aşkera xwe nîşan dide. Di dirêjahiya vê gotûbêjê de digel pesindana Mela, Mîr bixwe jî pesnê xwe dide. Mîr wesf û taybetmendiyên xwe yên hikumdariyê di warê îrfan û eşqê de jî bi bîr tîne û bi vî awayî bi şanazî behsa hêza xwe ya madî û manewî dike.

Mîr:

Ji neş'a badeya kasê bi zat ez xerqê 'urfan im
Bi wê camê bi wê tasê sifetkisra we xaqan im
Ji berqa xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (r. 304)

...

Di perwazê humadeng în me ser da tacê îqbalê
Şehê Keyxusro û Zeng în serefraz în di vî halê
Werîn saqî meya rengîn me dil maye di vê qalê (r. 308)

Mela li beramber mezinahî û şanaziya Mîr gelek dîlnizim e û xwe li ber dergehê wî axa bin lingan dizane. Mela dibêje eger ez biçim ser felekan jî dîsa di benda Mîr de mîna nêçîrekî me û Mîr kengê bixwaze dikare min nêçîr bike. Çawa Mîr xwe di hikumranî û eşqê de xwedan hêz û desthilat dizane, Mela jî bi heman şêwe wesfên wî yên desthilatdariyê di warê gotin û edebiyatê de jî bi bîr tîne û bi van gotinên xwe şanaziya Mîr dupat dike.

Mela:

Di rê da xakê dergah im belê ewwel ji vê xakê
Bila bê paye û cah im me pê çû ferqê eflakê
Şigarek derxurê şah im di wî bendê di fitrakê

Di îqlîmê suxen xaqan rewanbexş û şekerrêz î
Nehin wek te di afaqan bi can ra 'enber'amêz î
Ji sîmînsa'îd û saqan bi sehharî guherrêz î (r. 308-309)

Mîr weku meqamê pesendkirin û qebûlê, Mela di huner û edebiyatê de melevan û sihêrbazê deryaya gotinên mirarî û ji Misirê heta Qezwînê weku xwedî helbestên şekerbar wesif dike ku dikare di carekê de sed helbestî li hev bîne. Herweha Mîr di dawîya vê danberhevê de ji ber hunera bilind a Mela wî weku ustad qebûl dike. Ev pesindan jî nîşan didin ku cih û pileya Mela di nezera Mîr de gelek bilind e û Mela helbestvanê herî mezin ê seraya Cizîra Botan e.

Mîr:

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
 Ji nezma te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezwînê
 Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê

...

Di baxê lefz û me'nayê suxen min serwî azad e
 Ji îmla û ji încayê me lewhê dil numa sade
 Ji husnê rewneqek dayê ku Şeyx Ehmed me ustad e (r. 310)

Mela di dawiya danberhevê de rasterast diyar dike ku di bin xizmeta Mîr Umadîn de ye û di qulzuma wî ya nîmetan de gewheran berhev dike. Yanî bi saya wî dikare van gotinên mîna dur û mircanan li hev bîne. Ev jî bi awayekî aşkera nîşan dide ku Mela helbestvanekî serayê ye û di bin sîbera seraya mîran de kariye hunera xwe bîne holê.

Mela:

Ji behra qulzuma mîran bi xewwasî guherçîn im
 Di behsa 'ilm û tefsîran tu deryayan we nabînim
 Ji mîr û begler û çîran xulamê mîr Umadîn im (r. 310)

4. Xurûra Mîr û Şanaziya Mela

Melayê Cizîrî ji ber peywendiya wî ya bihêz digel mîrên seraya Cizîra Botan û weku helbestvanê vê serayê dema di helbestên xwe de şanazî bi hunera xwe dike di heman demê de xurûra seraya Cizîra Botan jî temsîl dike. Bo nimûne dema ji ber dizîna helbestên xwe rexne li Melayê Finikî digire, Finika navçeya Mîrekiya Cizîra Botan jî li hember Cizîrê biçûk dixê. Ev malika Melayê Cizîrî tenê reqabeta di navbera du helbestvanan destnîşan nake, di heman demê de mîlîlaneya navbera paytext û navçeyan jî nîşan dide. Lewra di Serdema Navîn de di nav sîstemên rêvebiriyên monarşîk de tu carî navendê nedihîşt bajarên biçûk ên derûdor li hember paytext bihêz bibin û hêza reqabetê di xwe de bibînin (Kılıçbay, 2000: 116). Ji ber vê jî Melayê Cizîrî li ser navê seraya Cizîrê di şexsê Melayê Finikî de Finika navçeya herî bihêz a Mîrekiya Cizîra Botan biçûk dixê û bi vî awayî hêza paytexta patronê xwe nîşan dide.

Tu dizanî Finika te ne mekanê xezelan e
 Çi buha tîne meta'ê te eya bê ser û ber (r. 300)

Di Serdema Navîn de ji ber ku desthilatdarên îslamî tevî berpirsiyariyên dunyawî berpirsiyariyên uxrewî jî hebûn û hem dîn û hem dunya temsîl dikirin, karîgeriya îdeolojiya dînî li ser wan gelek bû. Ji ber vê çendê hikumdarên bi qasî helbestên pesindana desthilata xwe ji helbestên dînî û tesewufî jî hez dikirin. Loma jî Melayê Cizîrî dema xwe di eşqê de weku arifekî bêwêne nîşan dide hem dixwaze karîgeriya xwe li ser serayê û rêvebiran zêde bike hem jî ji hêla manewî ve dixwaze seray û paytexta Mîrê xwe bihêz nîşan bide. Mela xwe weku “arifê zeman û muftiyê eşqê” dibîne. Çawa ku sed mela û musteîdên li derûdora wî nikarin muemmaya eşqê hel bikin û ew çend ilmên wan nîne, Me’rufê Kerxî jî hewcedarê ilmê Mela ye. Loma jî Me’ruf divê ji Kerxê bê Cizîrê û li ber destê Mela tadrîs bibîne. Lewra Mela xwe li ser çiyayê Qendîlê weku fîlê eşqê dibîne, di nav baxê Botan de gulê herî bijarte ew e, ne tenê li Botan li seranserî Kurdistanê çiraya wî tarîtiyan ronî dike.

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
‘Arifê weqt im û Me’rûfî bila bête ji Kerx (r. 84)

Tu j’Mela her bipirs esrarê ‘îşqê hel dikit
Vê mu’emmayê çî zanin sed mela û muste’îd (r. 88)

‘Aşîqê mes’elewxahî were em muftiyê ‘îşq î
Destekî sunnet e tê da di yekî nessê kîtab e (r. 181)

Tu narê firqetê zanî dikarim ez tehemmul kim
Diyarê kohê Qendîl im meger fîl im di ‘îşqê da (r. 28)

Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im
Çî tebî’etbeşer û insan im
Lillahîlhemd çî ‘alîşan im
Di riya yar li rêza san im
Lew di iqlîmê suxen xaqan im (r. 273)

Mela çawa ku xwe di eşqê û ilmên manewî de arif dizane di heman demê de xwe di hunera helbestê de jî pêşeng û cîhangîr dizane. Lewra helbesta wî di rewaniyê de mîna avê diherike, gotinên wî mîna lu’lu’an in, eda û awayê helbesta wî di nav husneke tamam de xwedî sihr û efsûn e. Ji ber vê çendê jî xwe di warê gotin û edebê de mîrekî cîhangîr û serdarê helbestvanan dide zanîn, Ferruxê Sîstanî li ber xwe ferxê helbestê dibîne û helbesta xwe ji ya Hafîzê Şîrazî çêtir dizane û îddîa dike ku helbestên wî pêdivî bi helbestên Şîrazî nehiştine.

Husnê edaya te Mela her kî dî
Sehne lehu enneke 'eynu'l-fisah (r. 72)

Abê rewan min diye şî'ra Mela
Yunkiru li'l-mai li sûi'l-mizac (r. 68)

Şî'ra te Mela sihrê şekerrêz e bi mu'ciz
Zanim ji lebê le'li te ev lefz û eda girt (r. 49)

Pîrê şe'ar e di şî'rê we Melê şalifiroş
Tu nîşan min mede Ferxî ku li nik min bûye ferx (r. 84)

Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet (r. 51)

Di iqlîmê suxen mîr im di şî'rê de cehangîr im
We ye'lû mewkibe'l-'uşşaqî e'lamî we rayatî (r. 234)

Bi van mînakên derdikeve ku Melayê Cizîrî wek helbestvanekî mezin ê seraya Cizîra Botan bi helbestên xwe yê pesindariyê ji aliyekî ve dixwaze hêza hunera xwe nîşanî patronê xwe bide ji aliyê din ve jî li hember serayên din nûnertiya xurûra desthilatdarên seraya Cizîra Botan bike. Ev jî dibe sedem ku em malikên xwe pesindana Mela ji wateyeke nerîtî cudatir di çarçoveya patronaja edebî de binirxînin.

Encam

Di encama van nirxandinan de em dikarin bibêjin ku patronaja edebî weku rêyeke berhemanîna edebî di nav sistemeke patrîmonyal de derdikeve holê û di her serdemekê de bi dirûvekî taybet xwe nîşan dide. Di bingeha vê sistemê de hikumdar (patron) heye ku xwedî hêz û desthilateke mezin e û bi cazîbeya hêza xwe helbestvan û edîban li dora xwe kom dike û dibe sedema berhemanîna edebiyatek ku tê de hêvî û daxwazên wî berceste bibin. Ji bilî vê, parastina helbestvan û edîban li hember desthilatdarên dijber hêzeke manewî dibexşîne patron û parêzvanên van kesan da ku navûdengên wan bi hêza hunera helbestvanan bi başî û şîkomendî belav bibe.

Ji destpêka avakirina bajar-dewletan heta serdema modern di navenda vê sistema patrîmonyal de hikumdar hebin jî car bi car li tenişt wan; wezîr, mîr û rayedarên din jî bi rola parêzvanî û patronaja edebî radibin. Melayê Cizîrî jî di nav Mîrektiya Cizîra Botan de ku hikumeteke navçeyî ya dewleta Osmanî bû, herweku

ji hin helbestên wî jî diyar dibe, dikeve bin xizmeta Mîrê Cizîra Botan û pesnê desthilat û kesayetiya wî ya şikomend dide. Herçend li ser muxatebê qesîdeyên Melayê Cizîrî di nav lêkoleran de hizrên cuda derketibin jî bi raya me kesê ku Melayê Cizîrî di her du qesîdeyên xwe de pesnê wî dide Mîr Şerefê Sêyem ê mîrê Cizîra Botan e û Mîr Umadînê ku pê re danberheveke helbestî jî çê dike yek ji mîrên hînterlanda Mîrekiya Cizîra Botan e.

Melayê Cizîrî wek normeke qesîdeyên wê serdemê patronê xwe bi teşbîh û mezmûnên hevbeş ên edebiyata klasîk a îslamî dipesenîne ku di serfirazî, comerdî û hêzê de ji hemû kesayetên efsanewî derbas dike û bi hêz û şikomendiya xwe hemû cîhanê li dora roja desthilata xwe de digêrîne. Li hember vê xwe jî hewcedar û dildarê vê hêza wî dibîne û hêvî dike ku wî di seraya xwe de wek bende qebûl bike da ku ew jî bigihîje miradê xwe. Bi vî awayî Melayê Cizîrî mîna helbestvanên din ên serayê li gor binyad û naveroka qesîdeyan pesnê patronê xwe dide û mîna keke patronaja edebî pêşkêşî me dike di edebiyata kurdî de. Ji bilî vê, Melayê Cizîrî bi danberheva xwe ya helbestî ya digel Mîr Umadîn jî nîşan dide ku di têkiliyên xwe yên patronajê de gelek pêşkêşî û hatiye asta wê yekê ku digel mîrekî helbesteke hevbeş binivîse û di vê helbestê de ji aliyê mîr ve pesnê hostetî û hunera wî bê dayîn. Di vê çarçoveyê de jî Mela di çendîn helbestên xwe de diyar dike ku wî bi hunera xwe ji helbestvanên navdarên mîna Hafîzê Şîrazî û Ferrûxê Sîstanî derbas kiriye û bi vê şanaziyê jî xurûra seraya Mîrê xwe bilind dike.

Çavkanî

- Amêdî, S. B. (1998). *Hozanvanê Kurd* (Z. Zinar, Tîpguhêzî). Stockholm: Pencînar.
- Banarlı, N. S. (1997). *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi I*, İstanbul: Millî Eğitim Basımevi.
- Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname* (Z. Avci, Wer.). Stenbol: Avesta.
- Bruinessen, M. V. (2003). *Ağa, Şeyh, Devlet*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Çelebî, E. (?). *Seyahatname* (R. Dankoff-S. A. Kahraman- Y. Dalı, Amd.). Yapı Kredi Yayınları.
- Cizîrî, M. (2010). *Dîwan* (S. Dilovan Amd.). İstanbul: Nûbihar.
- Doru, M. N. (2016). *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri* (Çapa Duyem). İstanbul: Nûbihar.
- Doskî, T.Î. *Baxê Îrem* (Pirtûka Çapnebûyî).
- Ebûş, F. H. (2004). *El Medîne Kurdiye*, Erbil: Spîrêz.
- Ergün, Z. (2014). *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, İstanbul: Nûbihar.
- Hejar (1361). *Dîwanî Rebbanî Şeyx Ehmedî Cizîrî*, Tehran: Siruş.
- Hodgson, M.G.S. (1993). *İslam'ın Serüveni*, İstanbul: İz Yayıncılık.
- Kılıçbay, M. A. (2000). *Şehirler ve Kentler* (Çapa Duyem). Ankara: İmge Kitabevi.

- Lapidus, I. M. (2005). *İslam Toplumlari Tarihi* (Y. Aktay, Wer.). İstanbul: İletişim Yayınları.
- İbn Haldun (1991). *Mukaddime* (S. Uludağ, Amd.). İstanbul: Dergâh Yayınları.
- İnalcık, H. (2010). *Şair ve Patron* (Çapa Sêyem). Ankara: Doğu Batı Yayınları.
- İnalcık, H. (2017). *Has-bağçede 'Ayş û Tarab Nedimler Şairler Mutrîbler* (Çapa Sêyem). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
- Makdisi, G. (2009). *İslam'ın Klasik Çağında ve Hıristiyan Batı'da Beşeri İlimler* (H. T. Başoğlu). İstanbul: Klasik Yayınları.
- Mumford, L. (2007). *Tarih Boyunca Kent* (G. Koca-T. Tosun, Wer.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Ocak, A. Y. (2011). *Ortaçağlar Anadolu'sunda İslam'ın Ayak İzleri Selçuklu Dönemi* (Çapa Duyem). İstanbul: Kitap Yayınevi.
- Secadî, E. (1952). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bexda: Çapxaney Mearîf.
- Selefî, H. A.-Doskî, T. Î. (2008). *Mu'cemu's-Şu'eraî'l-Kurd*, Duhok: Spîrêz.
- Sevgen, N. (1982). *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri* (Ş. K. Seferoğlu-H. K. Türközü, Amd.). Ankara: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü.
- 170 Tanpınar, A. H. (2010). *XIX. Asır Türk Edebiyatı Tarihi* (Çapa Heştem). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Varfî, E. M. M. (Hoko) X. (1997). *Dîroka Dugelên Kurdan*, İstanbul: Hoşka Weşan û Lêkolîna Sîpan.
- Wellek, R.-Warren, A. (2016). *Edebiyat Teorisi* (Ö. F. Huyugüzel, Wer.). İstanbul: Dergah Yayınları.
- Xeznedar, M. (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr: Dezgay Çap û Bellawkirawey Aras.
- Yaşın, A. (2007). *Tarih Kültür ve Cizre*, Ankara.
- Zivingî, M. M. (?) "Muqeddîme" el-Iqdî'l Cewherî fî Şerhî Dîwanî Şeyxî'l Cezerî, Qamişlî.